



Welat

Rewşenbîrî - çandî - Giştî - serbixwe
Hejmara «3» an 20 Tîrmeh 2013

Ji destpêka dîrokê ve, şerê peyvê hat kirin nexasim ji aliyê sitemkar, zordar, mîr, û qîralan, belkî weku peyvê wan ditirsand, dijaminê wan ew neditirsandin, lewra ji despêka peyvê û dîrokê hat xwestin ku peyv mirî be, ji ber dema ku ew mirî be temeneê zordariyê dirêj dibe: çendîn ku hêza dektatorekî hebe, her li aliyê din hêzeke din ya xurt heye ku zora wê bibe, û dîrokê ev yek tekez kiriye, ti caran hêzeke çendî xurt be zindî nemaye lê tiştî zindî maye peyv e, û ew ya ku wan hêz ,dektator, sitemkaran wesf dide, ji hemî cengan tiştê ku ji nav wan saxlem derket peyv bû û ew ya ku bi ser ket.

raste gelekani ser dirêjahiya dîrokê xwestin ku serê peyvê biçemînin û bihêlin ku ew dîroka wan bipesinîne, lê peyvê dida zanîn ku ew bi zorê ji aliyê kesên ku ew firotiye hatiye nivîsandin lewra ti tişt ji wan nivîsandinan zindî nema, peyva ku zindî ma ew bû ya ya ku daxwaza mirovahiyê, aştiyê, biratiyê û wekhevîyê dikiri. belkî di şoreşa Sûriyê de , dîsan heman kesên ku di dîrokê de ji peyvê ditirsiyan û dixwestin dîsan serê wê bitewînin ev yek hewl dan û bêtir ji her tiştî şerê peyvê kirin, ji ber serkeftina mezn ne ya di cengê de ye lê ya di riya peyvê de ye, lewra û ji ber ragihandina peyvê bi hemî rastiyan di hundirê wê de , gelek ji çalakvanên sûrî p kurd bûn cangoriyê vê yekê, çî ku wwan baca vê rastiyan bi guleyekê an bi sizakirin û zindanê dabe.

li rex şerê rêjîma ESED ku têde hemî cûreyên çekan dijî gelê xwe biakraniye lê ew hewl ew dev ji peyvê bernade û hemî alavên ragihandina xwe xistine zimeta hêza xwe de da ku karîbe hinekî ji rastiyan biguhere. îro em wek gelê kurd û sûrî bi gelekî bi hewceyan kesên ku xwedî li peyvê derkevin, ji ber ragihandina peyva azad rûyê din yê rastiyan ye û ew ya ku dikare nerîna cîhanê li ser şoreşê çî bi aliyê erênî yan yê neyênî biguhere.

îro em bi hewceyan peyva azad in ne tenê bo şerê rêjîmê bi vî çekê sivil lê ji bo serastkirina kesên ku dixwazin şoreşê li gora berjwendiyên xwe ji bikarbinin, îro ji me tê xwestin ku em li kêleka şoreşa rûmetê bi peyvê bisekinin û wê destek bikin da em karîbin rastiya vê şoreşê ragihînin û da em rê nedin kesên ku dixwazin li ser milê wê siwar bibin ku siwar bibin û da şoreş di riya xwe de here ta biserbi keve bi ser bikeve

Aras yûsiv



welat.press@gmail.com

www.facebook.com/DengeKurdistanasurya



XEFKEKE NÛ YA RÊJÎMA ESED KU JI ME TÊ XWESTIN EM NEKEVIN HUNDIRÊ WÊ DE

Ji destpêka desthiladariya xwe ve, rêjîma ESED ya bav u law li ser têla tîreyî ango tayîfî listin, bo vê yekê çî kesî çepik ji wan re da ba , rêjîmê ew kes nêzîkî xwe dikir , li heman demê çî kesî ku çanda gendelilîyê li nik wî hebû û li gorî mewala rêjîmê .distra, rêjîmê ew bêtir nêzîkî xwe dikir Nediket bala ti kesî ji me ku rêjîma ESED li Sûriyê karîba wisa li ber şoreşa vî gelî xwe bigire û hewl bide ta dawî civaka Sûrî bêtir ji hev bixe û pêkhatayan jihev bitirsîne û çanda kînê di nav wan de biçîne, hevdem rêjîmê hewl dida çanda dijîtiyê têxe ne tenê di nav pêkhateyên civakê de lê di serê her weltiyekî de , jiber ev . yek bingeha sereke ya hebûna wî bû Li vê barê rêjîma ESED ji destpêka şoreşê ve hewl da ku wê bide nasîn ku ew ya aliyekî tenê ye , û ji ber vê yekê ta

ji rêjîmê hat ew dûrî kêmetewên Sûrî ket û xwe ji Suniyan tenê re vala kir , da karîbe armanca xwe bighîne serî

Li Sûriyê , sitemkarî ne tenê li ser suniyan bû, rêimê bi wekhevî sitemkarî li ser hemî pêkhatayan dikir , û divê ev yek neyê jibîrkirin ta ku ev şoreşa li ser zemînê bi ser bikeve , rêjîma ku îro xwe bi kêmetewên sûrî şêrîn dike ew tenê ji bo xwe ji şerê suniyan re vala bike , şoreşê têk bibe û ne ji ber ku hezkera .kêmetewan e Îro ji hemî gelê Sûriyê tê xwestin ku paşeroja vê rêjîmê jibîr nekin û bi hewldana wê ji nêzîkbûnê ji kêmetewan neyê xapandin, da pêşerojêke xweş li pêşiya vî gelî be , ji ber rêjîmek wek ya ESED ya bav û law li ser hizrekî tîreyî teng û sitemkar ava bû ye û ew nikare ji dev ji vê yekê berde , hewldana rêjîmê ji



nêzîkbûnê ji kêmetewan û şerê suniyan tenê daveke divê kêmetew nekevin wê de ,û eger rêjîma ESED xwedê neke di vî şerî de biserket ew ê dîsan li çanda xwe ya totalîrîte, nijadperest , kevnepereşt û .dektatorî , vegere

Helbest YÛSIV

Petrol û şoreş

Di salên 1980ê de desthilata Sûrî petrol bi girsayî ji nava qada Cizîrê dikişand, berhemên vê qadê digihaştê asteyine pir bilind (700,000 bermîl di rojê de) lê desthilatê nedihîşt ko serjimêriyên fermî bigihêjin asteyekê ko derbasbûna Opêkê lê bibe mecbûrî. Xwe her dem dikir rebena ko bi zorê û heft bela piçek petrol ji qada xwe derdixîne, ji ber ko çî dewleta derbasî Opêkê bibe gereke li gorî mercên evê dezgehê bimeşe, û yekemîn merc ewe pêşxistina diravî di gund, navçe, bajar, û parêzgeha de ye, herwekî pêdivî ye ko radeya bêkaran pir kêmetewên bibe û hal û malên xelkên Sûrî xweş bibe.

Lê bi gelek egeran desthilatê welatî dixapandin nemaze welatiyên Ereba ko kêşeya berxwedana li dijî Israîlê gûr û geş dikir di mêjî û sewdanên zarok û mezinan de, û xwe dikir bav û xwedî ji



Filestîniyan re bê ko guleyeke tenê bête teqandin di sînoren Israîlê de.

Bi vî hawî welatiyên sûrî bê deng diman li himber rewşa diravî yî xerab di welêt de, û xwe bê hêvî dihiştin li gel guherînên

sêyasî ên herêmî û navnetewî nemaze piştî ko dewletên Xelîcî bi ser ketin û bi hezaran kompaniyên biyan cihên xwe li nav dever û bajarên Xelîcê girtin û kareke bi nîrx û cihgirtî di hemû waran de hate kirin.

Zeman zîvirî û agirê şoreşan bi nigên sitemkarên rêjîmên diktator ve ket, û destgîriya wan li ser milletê wan hilweşiya. Lê li Sûrî tiştêkî cêwaz e, tiştêkî dîtir e, tu kesî pê nebihîstî ye ne jî dîtî ye, dunya tev di vê pevçûnê de başdar e, bi melyonan perçiqîne û ji nêza ketine, û bi hezaran sûd û fêde ji evê şoreşê dîtine, ev sûd jî bi piranî di petrolê de ye.

Pîrekekê li bajarê Dêrazorê digote: «ev deh rojên min ez petrolê difroşim ez bû me melyonêr û Beşar Elesed ev çel sale

wî petrolê difroşe ma gelo ew bû ye çi ?!» herwekî gelek kesan diziya petrolê û xerakirina bîran ji xwe re helal dikirin û digotin: « ev petrol a me ye, ji ber ko ji qada me ye».

Lê mixabin bi dehê bîran serikên wan (Christmas tree) firandine, û bi sedê boriyan qul kirine, û gelek erdên çandiniyê li ber qirêja petrolê winda bûne, û bi dehê nexweşiyên bê çare bela bû ne.

welatî jî wisa dibêjin:» ma ko evan kesana petrol nefrotibana wê kê tirimbêlê xwe ajotiba, wê kê kargeh û

malên xwe ronî kiriba.

Gelek rewşenbîr û sêyasetmedar jî rîfaynerên biçûk didîtin çareseriyê bo evê pirsgirêkê lê pir buha ne û berhemên wan jî qelsin. çareseriyê vê pirsgirêke ewe ko desthilat vegere lê di destine paqij de ko rîfaynerên dewletê bi xurtî vegezin karên xwe, û dîsan petrol bête binaxkirin û riya xwe di boriyan de bi aşitî bibîne heya bigihêje rîfayneran bê deng û his, lê em deng û hisê wê bikin di pêşxistina welatê me de di pêşeroja nêzîk de.

Sîpan Ehmo

Kesekî kurdên Rojavayê tune ye

Serêkaniyê, bi cengên xwe guhertina bingehîn bû di rewşa Rojavayê de, bi wê agir bi ser dergehên bajarên kurdî ve bû, her wiha helwesta kurdên birayên Rojavayê hate diyarkirin. Kurdên Rojavayê ji xwe dipirsîn: Çawa bajarekî kurdî li Rojavayê, ji paş sînorekî ku bîst milyon birayên me yên kurd li wir in talan dibe? Êrîş bi ser me de dibarin, artêş, pîlan û agir, ka dengê bîst milyon birayên me, kanîn xwepêşandan û pirotêstên wan bo zextekê li Erdogan bikin, pîlan û êrîşan rawestîne ? Ev tangên ku derbas dibin Serêkaniya Binxetê ji Serêkaniya Serxetê derbas dibin, di rex birayên me re, li ber çavên wan? Li vir em di warê pirs û gazinê de ne, gazina birayan ji birayan, hêvî û hezkirina birayan ji birayan re. Serxetî, birayên me binxetiyên, cewiyên me yên li paş sînor, nuha û Rojava rojên xwe yên dijwar, di ceng, birçîbûn û penaberiyê de derbas dike, ger ji we bipirse hûn çi qasî bi min diramin, yan hest dibin, hûn bo min çi dikin, bo êş û tengzariya min, wê bersiva we çi be? Wê birayên Rojavayê yên li Başûr_birayên şêrîn_ çi bersivê bidin? Werin em rastiyê ,bibêjin, çendî tehil be jî rastî kengî şêrîn bû?! _Hûn kurdên Sûriyê ne !! Birayên kurd li Başûr ji kurdên Rojavayê yên penaber re dibêjin. Ev gotin gotina libinaniyan li ser mirovên Sûriyayê li bîra me tîne dema ji sûriyan re digotin hûn sûrî ne? Ew di hundirê xwe de _her du gotin_ radihêjin nerazîbûnekê, kêmkirinekê, weke ku ji wan re bibêjin: Hûn li cem me



çi dikin, hûn bela serê me ne. Kurdên Sûriyayê tê wateya kesê ku ne li cihê xwe, bêhtirî vê berdeyam nakim. Werin em li bîra xwe binin, dema kurdên Başûr ,dihatin Rojavayê penaber û reviya yî ji agir û cengan, weke kurdên Rojavayê û nuha, mirovên Rojavayê ji wan re digotin: Hûn ji Kurdistanê hatine? Hûn pêşmerge ne? Bi serbilindî digotin, bi xweşiya mêvandariya .birayekî, bi hezkirina birayekî Li vir gazin û pirs hîna berdeyam in, hîna gazin û pirsên biraya ne, ji birayan. Şaşitiyek heye. Em dixwazin bibêjin. Xwendineke şaş, alûziyek di têgihîştina biratiyê de ji dayik bûye, gereke çareser bibe Diyar e sînor ne bitenê bome û têt in, sînorên ku dijiminên kurdan biser ketin

bi avakirina wan di nîgaşa kurdan de, bi wan sînoran kurd dîrî êşên hev ketin, dîrî doz û nalînên xwe yên hevbeş, bitenê bi xwe diramin, dîrî birayên xwe, tengasî û pêdiviyên birayên xwe, bi hev hest nebin, bi erkên biratiya pîroz û gewre Rojava qurbanên xwe bo parçeyên xwe yên din li bîra xwe tîne, xwe bi aliyê birayên xwe de, çawa ber bi wan de dibeziya di rojên tengasiya wan de, çawa li biratiyê dinihêre, li kurdayetiyê, çi dikir, hîna çi dike bo dilê xwe, destê xwe yên li paş sînoran? Rojava li xwe dinihêre, weke ku bi erkên xwe rabû be, ne bêhtir, ji xwe dipirse, yan ji parçeyên xwe yên din, di rojên xwe yên dijwar û hişk de, bitenê ...dipirse, diçilmise, bitenê gazinan dike

Ciwan Nebî

Ciwanê serşikestî

Hebû nebû rehme li dê û bavê min û we bû, hebûn du heval cîranên hev bûn, wan gelekî ji hev hez dikirin, bi hev re diçûne dibistanê û bi hev re jî dihatin, navê yekî Baran bû, yê din navê wî Ciwan bû, rojekê ji rojan Baran vegefiya malê, hema derbasî odeya xwe bû, derî li xwe girt û li wir ma. Dîya wî ecêb ma, ji ber ku ew gelekî li odeyê ma û nehate hundur û bi xuşka xwe ya biçûk re nelîst. Diya wî kir û nekir, Baran neaxivî, û deng jê neht, lê hema li ser deftera xwe wêneyê zarokekî serşikestî dikişand û bi xemgînî lê dinêrî, çavên dîya wî li wêne ketin, rabû jê pirsî: ha kurê min Baran, ev lawikê serşikestî kîye?! Te çi xweşik ew kişandîye!! Baran bi xemgînî got: ev Ciwan e! lawê cîranê me ye!! Dîya wî got: waaaax, û kê serê wî şikandîye!! Baran girîya û got: ez im



dayê ez im, min serê wî şikand!! Dîya wî got: tuyî!! Û te dît ku serê wî yê şikestî girêdane weke te di wêne de çêkirîyê!! Baran hîn digirîya û got: na na, lê xwîn ji serê wî hat û ew birin. Dîya wî got: û te çima wisa kir!! Ma ne ew hevalê te û cîranê te ye!! Qey tu jê hez nakî!! Baran got: ez jê hez dikim, û bêhemdî min bû, ha de bila ew min bibûre! Dîya Baran got: xem nake kurê min, tu şaş bûyî, de ka em herin mala wan, madam ku tu jê hez dikî, lêborîna xwe jê bixwaze!! Mirov xeletiyekê derheqê hevalê xwe de bike divê lêborînê jê bixwaze. Û rabû dîya wî porê wî şeh kir, cilên paqij lêkirin, diyarîyek da destê wî û çûne mala Ciwan. Li wir Baran lêborîn ji Ciwan xwest, diyarî da destê wî û jê re got: bibûre Ciwan, min nedixwest serê te bişikînim, ew bêhemdî min bû. Û herdu dîsa vegefiyan bûne hevalên hev.

Jan Dost



Ka em
alîkariya
mişkê
bikin bo
bigihê
xwarina
xwe



Rapor - şoreşa GIRKÊ LEGÊ û sedmên qelsbûna bizavê

Dema simbola şoreşa azadiyê li DARAAÛÊ hate hildan ronahiya wê de tevahiya bajar û bajarokên li sûrî û bi tayebetî bajarên kurdî yên ku bi dehên salan di bin zordarî û setemkariya rêcîma BaaS de bihûrandin , GIRGÊ LEGÊ yek ji wan bajarên ku bi dehên salan kar û xebat kir bo azadiyê û mafê xwe yê rewa bi cih bînê , û azadî dît ji dûr ve di çirisîne xwe ne dît jê cuda ye û bidest xwenîşandana kir û bankir bi dengê şoreşê bi biryên xwe re yên li DAARYÊ Û HOMSÊ Bo .AZADIYA welat

Wek tê zanîn yekemîn xwenîşandan bi 9 rê ve çû di kolanên GIRKÊ LEGÊ de di 2011an de û her weha 7an sala heyva kolanên bajêr ne mane vala ji dirûşim û siloganên şoreşgerî , û bankirin bi roxandina rêcîmê û mafê çarenûsê ji . doza kurdî re

GIRKÊ LEGÊ hate naskirin bi xwenîşandanên xwe yên ber ferh û di heman demê de salê de xelkê bajêr li kolanan di germahiya havînê de û di . sermayaya zivistanê de

Lê van rojan qelsbûn kete karê hevrêzên



xortan de wek tê zanîn ev kete heyva dudu an de dengê şoreşê ji kolanên GIRKÊ LEGÊ ne hatiye û gelek sedemên vê qelsbunê hene. endamên hevrêzên xortên girkê legê van sedeman şirove .dikin

EDNAN ELÎ: ne yek bûna kolana kurdî û derbas bûna bercewendiyên partiyên kurdî di hundirê hevrêzan de û ne

îmzekirna rikberiya sûrî li ser mafên .kurdan

ABD NASIR: penaberiya xortan li derveyê welêt û şoreşa sûrî ketiye qûnaxa çekdarî de ew bû sedema .qelsbûna karê aştiyane

Ne tenê sedmên siysî hene, sedemin civakî jî hene çalakvan ADNA REMDAN dibêje ezmûnên xwendekaran û herêma kurdî herêmeke çandîni ye û millet van rojan mijûl bûye bi karê çandiniyê ve û peyva xwe berdewm kir û got: Şoreş wê berdawem be li sûrî bi tevahî û bi teybatî li herêmên kurdî ew milletê ku bi sedên salan li ber xwedide da ji bin setemkariyê derkeve û got ev qûnaxeke dîrokî ye ji kurdan re, û ew ê dê .mafên xwe tê de çaraser bike

Her wiha pirsê çalekvanan li GIRKÊ LEGÊ ew e: kî gunehkarê dûrbûna xortan ji şoreşê ye, rikberiya sûrî ye, an jî partiyên kurdî ne, an jî sedemin din jî hene .girêdayên rewşê bigiştî ve

GULAL LIYANÎ - GIRKÊ LEGÊ

Hêdî hêdî

Hêdî hêdî	Encam neke	Çîrokên ber koziyan	Venasîna rasteqînan	Pût û peykerên gewre
... Dostê mino hêdî hêdî	... Hêdî hêdî	Bi zimanê min	Jîrkirina dijber û rikbera	Li ser çavên birçiyar
	... Çimkî	Belav neke .. Neweşîne	!.. ne	Tu ezmûnan sernaxin
	Sungiyên tolazan	Qirana pesindanê		... Hêdî hêdî
Di kevanê dilê min de	Di tengala sosinan de	Di boçûnên min de	Hêdî hêdî	... Çimkî
Rima poşmaniyê	Buhar şewitan din	Geş neke .. Nepejrîne	... Dostê mino hêdî hêdî	Lêvên bi ramûsan
Bi destê rahêner û	Rêberiya qeşmerokan	Bi zimanê kostek kirî		hingavtî
filebazan	Di serbaziya dîlanê de	Ber dadgehê		Dev ji dilçûnê nabin
Şiyar neke	Govend şerpeze kir	Min nekşîne .. Ranekşîne	Baranên payîzê	Geliyên ji qirêjê
Bi nixê têkçûnê		... Hêdî hêdî	Di qurmên miçiqî de	pêngavtî
Giyanê min	Hêdî hêdî	... Çimkî	Nîşanên buhara nadin	Tu çiçekan bel nakin
Di rûdawên bihûrî de	... Dostê mino hêdî hêdî	Binavkirina kêşeyan	Şop û rêçikên têvel	Ew dara kurm lê ketî
Gunehkar û tawenbar		Rûxwandina şiyar û	Bi hêvî û lavlavan	Sînga şalûr şanakin
neke		!.. omîda ne	Rûyê rastiyê nabin	Hêdî hêdî
Bi egera tolvedanê	Dara kurm lê ketî	Bilêvkirina nerînan	Bejnên lawaz û şikestî	... Dostê mino hêdî hêdî
Meremên kînan	Di temenê min de	Dabiryana mizmiza	Bi qijqij û qêrînan	
Di şewata cerga min de	Ne afrîne .. Neçespîne	!.. debenga ne	Deskewtînan hilnagrîn	

Ronî ELÎ

Pênûs û Pirtûk2- Anahîta Û Hestî Ji Damarên Xabûrê

Gelek buhar derbas bûn / ne xweşbûn
wek dilê te
Pir helbest min nivîsand / ne kûrbûn
wek çavên te..

aniha emdixwazin pirtûka
helbestvana hêja (Anahîta) bidin
nasîn, ya bi navê: (Hestî Ji Damarên
Xabûr) û çend gotinên naz bi ser de
bixemlînin, helbestên vê pirtûkê tev
bi celbê çarînan hatine hûnandin an
bi vî rengê hatine nivîsandin.

Xuya dike perçên helbestên vê pitûkê
ne dirêjin, û bi kurtî helbestvana çak
dikarîbû hest û helwesta xwe têr
bike, an kul û derdê xwe vala bike li
ser rûpela bedew, bi awayekî hindik
û rindik. (Wek payizê tim serxweşim
/ Li hemî waran diweşim).

Ev nêrîn hate gotin bo şewê hunera
hûnandinê tenê, lê ne ev tenê bala
mirov dikşîne, ji ber ya giringtirîn
şewê ewe naverok helbestê ye, çî ji
hêla pevy û gotina, çî ji hêla wêne û
sawîr û hunandina wan bi hev re. Tevî
wiha jî, çawa arîşan hatine ristin,
rengê mebesta nivîskar çiyê? ev
rengê helbesta bi vîn û evînî qeşartî
babeta çiyê?

Gelek caran min dixwestî / yek li
çavên min vegere
Ji bo dîtina min keçkê / li ber royê
here û were..

Xweş xuya dibe, ku Anahîta bi evîneke
rast û germ, evîneke wêrek û bêtirs
her tiştî dibêje, çimkî bi germiya dil û
evînê re hatiye stiran, an evîn bê kul
nabe, û hêvî bê derd nabin, her wiha
jî ev daxwaza van perçe helbestan
wihaye û tore divê wiha be.

Tilîkên weke mûmê / kulên min
dilorîne

Ew peyvên tey bi basik / dilê min
difirêne..

Belê, her keç an jin van hevokan



nikare bêje û ehwa qeşartî hêviyên
dil û daxwaza can di babeta helbestê
de bîne. Ne ev tenê jî, jiber hunadina
bi wêna û mînak her pênûs nikare
bîne ziman wiha bi hesanî.

Nuha me divê di der pirtûka Anahîta:
(Hestî Ji Damarên Xabûr) ya di sala
2002 de hatiye weşan ji hêla kovara
(Zevî) du peyvên bêjin.. bi xwe ev
pirtûk ji 47 perçe helbestin û bi 66
rûpelan amadeye, û her perçake
helbest ji 3 an 4 an 5 çarîkan hatiye
ristin, û ew bi pêşgotina helbestvanê
hêja Arşevê Oskan pêşbû, yê der
dermafê wê de bi zimanekî helbestî
dibêje: (Dema min çavê xwe bi
helbestên Anahîta kil kirin, mîna
kaniyên Xabûr di damarên min de
herikîn... lewra min heskir li nav van
hest û sawîran bigerim û qonaxa
afirandinê tê bipivim... min dît:
herwekî mîna bexçakî tije kulîlkên
rengîn, gul û binefşin... û asoyê wê
tije awaz û neyazin).

Û di dawî de Arşev dibêje: (De bêje
Anahîta bêje, bila helbestên te liser

zimanan biçêrin û di damaran de şax
vedin. Û her di gulîstana afirandinê
de tê bijî).

Dilê min jor-jor friya / law xatir ji
nalînê xwest

Evîn ji xwere kir basik / pê rizgarkir
qêrîna hest..

Helbestvana me Anahîta weke jin,
reste-rû gotinê xwe dibêje, şerm û
fedî nake ji hestên xwe yê durist,
çimkî raste bi xwe re, xwe naxapîne,
xwe venaşêre, kê mîna hene dinav
me de wiha serfiraz û têgihiştî,
wêrek û çak. Axîna dil dadixîne ser
rêx û rûpelan, mîna ewrê baran û
birsûk bigre wê ser xaka por bigrî bi
pênûsekî zelal û şînahiya keval.

- Kinê min we nexapîne / ew ji dil ne
hatiye

Gelek birîn û nalîn / di bin de
veşartiyê...

Belê, wêneyê helbestê hesî ne, mînak
eve, Û her dibêje û dibêje:

Liser dil datînim destan / hesdikim
pis-pisa hestan

Li ser tevna wan dirêsim / gelek stiran

Dilê welatê min

û helbestan

Ez dizekê ramîsan / ji lêvên naz û ciwanan

Ew meya ku ez vedixum/ peyda nabe li meyxanan.. Û hunandina hevok pir bi palkêşe û ji wan bînin ziman, mîna: Ez hindik hindik dimrim / nikarim ber xwe bidim

ji vî temenê ciwan / ez mafê êşe didim

An pir wênên çak di vê pirtûkê de derbas dibin bi me xweş mînak:

Dest di dest de dil di dil de / bêdengî tev bibû ziman

Bi awiran hat girêdan / gelek soz û bend û peyman..

*_*_*

Ev jî perçeke ji helbestekê ji Pirtûka (Hestî Ji Damarên Xabûr) bi navê (Şev):

Li ser têlên vê şevê / ez hêvîyan raddixim

Şewqa heyvê didizim / tariya dil derdixim

Heyv şivanê sitêrkan / ez şivanê heyvê me

Ew di dil de diçêre / şev pê de li bendê me

Dînbûna şev xweşe / kulan tev wînda dike

Dil tê de bê pasepor / sînoran derbas dike

Ew dostê evîndaran / dil bi wî bilind dibe

Bi delalî xewn tê de / bê merbend xwedî dibe..

Û gotina dawî ya pir xweş û palkêş. gava Anahta dibje:

De bajo lawiko bajo / kiriyên hestên ciwan

Destan veke hemêz bike / şahiya dînbûn dilan.

Xort û civaka gel

Dibêjin:

Xort(Keç û law) çiraxa ronahiya mileta ne, û ala pêşketin û pêşveçûn a civaka ne, çimkî hefsarê Gerdûnê di nav tiliyên hiş û hastên wan de girêdayî ye, Çiqas civak li wan haydar û agahdar be

bi çalakiyên xwe û hêza xwe av didin û şîr û gulgulî dihêlin. Ji ber kû kilîta narvînê di destê wan de ye, û raze û nehîna mayînê di nav raman û cinavê wan de şahiya xwe berdeyam dike.

Xortên me yên kurd ewin yê kû çirûska şoreşe bi keys û fesal kirine



ewqas wê pêşketî û bihêvî be. Xort çirûskên serhildan û şoreşa ne di civaka gelan de, û ew xunceyên dara jiyana wan ya bi rûmetin, li vir pîwîstiya rola xortan bi xurtayî xwe nîşan dide.

Xortên me yên kurd weko beşek giring ji rêxistina xortên cîhanê bi tevayî û ji civaka kurdî ew jî rola mezin û herî giring dilîzin di hemî hêl û berghên civaka me de, û dara erezo û niyazên me

û riya berxwedanê û serhildanê li pêş gelê kurd vekirine, nemaze partiyên tefger a me ya kurdî de. Ew çiçekên azadiyê di landik mirovanetiyê de geş û bi reng dîkin, û li asoyan digerin, û li seranser gelê kurd û cîhanê belav dîkin.

Silav û rêz ji xortan re, û her bimînin çiraxa geş di jiyana gelê me de.

narinomer76@gmail.com

Narîn Omer

Ciwanê ABDAL

Jin Bi Êşa Dil Nahesin

Lêkoler dibêjin nêzîkî 40 ji sedî ji jinên bi nexweşîya dil derbasî nexweşxaneyan dibin gazinan ji êşa dil nakin.

Lêkolîna ku di kovara American Medical Association de hatiye weşandin, dide zanîn 31 ji sedî ji mêrên ketine nexweşxanê bi êşê hest nekirine. Herwiha lêkolîn êşkere dike 15 ji sedî ji jinên bi nexweşîya dil mirine, beramber 10

ji sedî mêran.

Li gorî rojnameya New York Times, nivîskarê lêkolînê John Canto ji Navenda Herêmî Lakeland ya Saxlemiyê li Florida û hevkarên xwe zanîn ji dezgeheke niştimanî bikar anîn derbarê kesên di navbera sala 1994 û 2006 ketine nexweşxaneyan de ku hejmara wan bêtirî yek milyonî.


Welat



مرحبا كوليرا ..
أنا خايف كثير..
معقول يغسل ايديه
قبل ما ياكل!؟

اذا حكيك صحيح
وصاحبنا ما بيعتني
بنضافتو.. معناتا راج نندس
بجسمو مع الأكل .. والله
لنكيف..

له يا تيفوئيد !!
تف من تمك!! بسوريا
حرب وماحدى فاضي
يغسل ايديه




الحرب قدرنا
9 صحتك قرارك



Mûzîka Kurdî û amûrên wê (3)

Mûzîka Kurdî û amûrên wê (3) Di vê jimarê de em ê li ser du amûrên bayî dê bi axifin û noteyên wan şrove bikin ...yek ji wan Mey e û ya din jî Zurne ye...


Mey



Mey:

Amûreke ba ye, li gor kurdên bakurê Kurdistanê û (Sovyetê) bi Mey têngasîn, lê li başûr û rojhilatê Kurdistanê bi Balaban

Tonên Mey (G:Sol)



* meys (Sol) jî oktavêdidiwan despêdike û çî yê sisyan de bi dawîdibe

tê binavkirin. Amûreke pir kevin e, û ji du beşan pêk tê, devik(ji qamîşê tê çêkirin û dirêjahiya wî nêzî 10cm e), û lûle(ji textê gelek daran tê çêkirin, wekû: gûz, tû, mişmiş...hwd, û nêzî 35cm dirêj e). Pîver(terazî) ya wê ya muzîkî oktavek û yek deng e¹.

Jibo stran û destanên folklorî têtê bikaranîn. Herwiha li Ermênya² û Azerbêcanê jî muzîkjenên vê amûrê hene³.





Muzîkjenên vê amûrê yên bi nav û deng ji kurdan: Egîdê cimo, Nîzametîn Ariç.


Zurne:

Amûreke kevn e, li hemû der û dorên Kurdistanê tê jenîn (li derine din jî wekî bakurê Afrîkayê jî heye, lê li gorî gelek

despêka stranan de carê tê jenîn. Herwiha, zirne ji du beşan pêk tê: text(ji dara ebenosê, gûzê, mişmişê...hwd-li gorî peydabûna darê-), û beşê dev(qamîş) Zirne, bi 7 qulên xwe yên jor, û yeka jê⁴, dikare bi daholê re bêhtir jî hemî amûran govend û dîlanan bigerîne. Ji muzîkjenên vê amûrê li



Tonên Zirneyê (G:Sol)



çavdêran, Kurd di jenîna zirnêde taybetmendiyêke cuda ji wan re heye, li ser asta rojhilata navîn).

Zirne bêhtir di şahiyên zemawendan û cejnan de têtê bikaranîn. Ji aliyekî din ve, di

ser asta Rojava: Ezîzê Temo ji Amûdê, Hisên Hec Nasirji Efrînê

îmad talatî û ronaxê şexmûs

الابجدية الكوردية

سلي Neyînî	غضب Hêrs	تشاوري Rawêşkarî	تصدير Hinarde	سد Bendav
ترجمة Wergerandin	درع Mertal	حفيد Nevî	واردات Dahat	خليج Kendav
أداة Alav	عملة Dirav	شعار Silogan	جغرافية Erdnîgarî	جزيرة Girav
مادة Bûjen	غياب Pêwarî	رمز Simbol	سلوك Reftar	شرط Merc
إنتهازي Keysbaz	مزح Tinazî	لافتة Pankert	أفعال Kiryar	قارة Paezemîn
ثقافة Çand	إيجابي Erênî	تمثال Peyker	إلتزام Pabendî	مبدأ Rêbaz



أغنية أخيرة إلى صديقي الكوردي مسعود

اعذري مسعود، أكنيتك بقوميتك. رغم أنك، بالنسبة للجميع، ذلك الأسمر المضحك، والعيون الضخمة.

ها هي شهادة (نبراء) تعبر بأكثر، تكتب هذه المرأة من دوما، لحبيبتها الكردي (ألن) : (حبيبي الكردي، يرسمون بين أجسادنا حدوداً ثقافية... حدودك حبيبي جسدي، والذكريات البعيدة في الماضي.. أشعر لمستك أقدم من كردستان).

(ليس للكردي إلا الريح) قال محمود درويش. وكذلك، للشعوب ذلك الحق العظيم الأوحّد؛ في تقرير مصيرها... لكن سورية، دامعة اليوم، وربما نادمة، بكل ما للندم من حرقة على الماضي. (الأكراد، أولئك الشبان المولعون بالسياسة وأغاني الترحال، والحب المثالي كأسطورة... هل سنودع هؤلاء الشبان من وطني؟؟؟).
ربما كان الأكراد كالغجر، يصعدون إلى السماء حين تنتهي حكاياتهم، ولكنهم يجهلون أن سورية ستخسر دونهم تنوعاً في الثقافة، وربما تفقد شوارع دمشق تنوعاً. التنوع الكلمة الأساس لفهم الحرية.

إن رحلت مسعود، ستخلو (الشعلان) من ألمع الصحفيين، ولن يتجرأ مثليو الجنس على إظهار رغباتهم، وكذلك المرأة لن ترفع صوتها. قوميات أخرى ستذوب في الخوف من الأحادية، ذلك لأن الأكراد رحلوا، وفقدت سورية لونها، وكُرّس التشابه، ودُرّما أن نعيش مختلفين.
إن رحلت صديقي مسعود، ستشبه أقرانك الأكراد وحدهم، وأسجن في تأثري بثقافة من حولي، فنشبه، أنا وأنت، من أجبرونا على مشابھتهم. على كل حال، سنعيش، لكن دون إبداع.



(سوري. سوري) وكأنني أجهل أسطورة الملك (أزدهاك)، ولست قادراً على الاستمتاع بحكاية (مم و زين)، وحكمة (ميديا) و(الأيوبيين).

مسعود صديقي، ومن ثم الكوردي مسعود، لن ترحل، حاول أن تغن معي، كغجيرة تتألم لخيانة حبيبتها : « آزادي » لكل الأفراد، ولتسقط الجماعات، الجموع التي احتلتنا سابقاً، عصابة الأسد، والاستعماريون الفرنسيون، والعثمانيون، وحتى أولئك القادمون منهم إن لم يسمحوا للسوريين في المدارس على تعلم لغة عشاقهم : « آزادي »

بقلم : علاء رشيدى

إن رحلت، تخسر لغتنا أنوثة « الواو » الكردية، ومتعة تغيير الأسماء : قامشلي، قامشلو... وسيرضى الأعراب النمطيون أن لو حاتنا التشكيلية ستفقد ألوان طبيعة الكوبانية وعفرين، وسيرضى الطغاة أن إناثنا تحرّم في لباسها، من ألوان الجزيرة الفراتية.

أن يبعثوك صديقي مسعود، وأجبر على دفع رسم الدخول لزيارتك، فتصبح سفرة رسمية للقاءك، فيوقفني أحد ما، عين بلباس عسكري من قبل سلطات لن تخترها لا أنت طبعاً، ولا أنا. وسيسألني : (هويتك، جنسيتك)، وأخشى أنني سأجيب بإسمي وأقول مجبراً : (سوري، سوري)، مخفياً أن بداخلي تتكرر أغاني النيروز، وتمتزج ألوان الدبلان :

الحروب والأطفال

تعتبر الحروب من أخطر الكوارث التي تهدد وتقتل البشرية، ولكن الفرق بينها وبين الكوارث الأخرى إنها من يد البشر، بينما الكوارث الأخرى فاعلها من يد الطبيعة.

فالإنسان يبين نفسه ويظهر على صورته الحقيقية في الحروب، التي كان هو العامل الأساسي في وقوعها ضارباً كل مبادئ الأخلاق والإنسانية والحقوق عرض الحائط. فالحرب ليس مسمى فحسب وإنما كتلة من الدمار الهائل، يرسل أشعته المحملة بالموت إلى كل بقاع الأرض، كما إن له آثار قد لا تنمحي على مر الزمان وبعضها حتى لا يرى بالعين المجردة، فالحرب يدمر الاقتصاد، يمحو الأخلاق، ينفي المبادئ، يرمي الأصول و يدفن الحقوق فهو أب مخلص للفناء والتشرد.

و للحروب آثار سلبية على المجتمع عامة والأطفال خاصة، فالطفل ذلك الشخص البريء الذي اعتاد العيش بسلام في أحضان أمه وترعرع في كيان بلده، لم يجد نفسه إلا أمام دبابة أو مدفع أو قذيفة طائرة وكل هذا أثر عليه لدرجة أصبح من غير الممكن محوها من ذاكرته.

جسدية وخيمة من الاضطرابات النفسية وحالات التبول اللا إرادي نتيجة الخوف، ومشكلات في الأكل والتلعثم فكل هذه الآثار تدفع إلى زرع سلوكيات غير سوية في نفوس الأطفال.

فالأطفال هم المستقبل المشرق للإنسانية وهم الأمل الواعد للوجود وهم الشمعة المضيئة للحياة ولكن لمن يفهم معنى الطفولة، وليس لمن يمزجها مع دماء الجشع والطمع وضربات الحروب.

كفالك حروباً وإراقة للدماء كفالك تدميراً ونفياً للحياة كفالك خراباً عذاباً تمرزقاً للطفولة وتشثيتاً للعائلات.

تحاوروا بدل أن تتشاجروا تناقشوا بدل أن تقصفوا تجادلوا بدل أن تبيدوا فالإنسانية جميلة بالأطفال اشعروا بهم وبحالهم بطفولتهم وأحلامهم، بأثاركم التي تزرعونها في نفوسهم نتيجة أطماعكم. ضعوا الحق أمام أعينكم وانصبوا للطفولة تذكراً لا ينمحي من ذاكرتكم فالطفولة منبع الحياة ومستقبل الأمم.

مروة يوسف



الطفولة تلك الكلمة البريئة كانت عرضة لجشع الناس وقتلهم وطمعهم، حيث أنها مزقت أحلامهم وأبعدتهم عن لذة الحياة الكريمة، ففرز الليل أصبح صديقاً ينام مع الطفل ويصحو معه والألم والمعاناة والأسى احتلا مرتبة أصدقائه والخوف من الظلام أصبح وسواس رأسه كل هذا كان نتيجة الحروب التي اقتلعت جذور الإنسانية وزرعت الألم والحسرة والخوف في نفوس الأطفال، كما إن لها آثار

Serêkaniyê



56 saliya yekemîn partî Kurd li Sûriyê tine bîranîn

Bi helkeftina 56 saliya damezrandina yekemîn rêxistina siyasî li Sûrî hin çalakî hatin li darxistin.

Di roja Înê 2013 6- 14an de Li goristana bajêr şandek ji rêxistina Serêkaniyê ya PYDKS gora xebatkarê bi nav û deng Hemzê Newêran di gel gurzek gul serdankir.

Herwiha encûmena xwechê li Serîkaniyê ya ENKS ahengek ji bo vê hekeftinê li dar xist bi beşdariya hemû rêzên siyasî û civakî û sivil û gelek gotin hatin xwendin yên ku pîrozbahiya miletê Kurd kir û li ser astengiyên xebatkarên yekem rawestiyan.

Di roja yekşem 2013-6-16 rêxistina partiya pêşverû li Serêkaniyê ahengek ji damezrandina partiye bi beşdariya hemû rengên Serêkaniyê.

Baran Waşokanî

Daxir

Gundê me, deh diwazdeh malbûn, û bi Gund tevî, kûçikek bi tenê Hebû.navî wî Daxir bû

Bê guman, gundê ku kûçikekî wî bi tenê hebe, ewê delalî be. eger biçwa .ser kîjan tenurê, pîrekan nan di danê Mirov ya xwedê bêje, ewî jî, kêmanî ne .dixist karê xwede

Û kûçkatiya xwe, bi awayekî durist pêktanî!! Heme bi şev pêde, natoiya gund dikir, û kewtikewta wî ji guhê me nediket

Û eger yekî xerîb, dageriyba gund, pey diket û ew şerpeze dikir. Yan tirembêlek di gundre, derbas bûba, pêre baz dida, ta di karîbû

Û gelek caran siwarên biskilêtan li erdê di xistin

Bi rastê, kêfa gundiyan, gelekî ji Daxir re dihat. Ji ber ku, bi tenê bû((tu di zane her tiştek, ku kêmbê, buhaye.)) ev ji hêlekê ve, ji hêleke Dîve, da gundê derdorê me, ji gundê me re nebêjin((gundê bê kûçik))Ez bawerim, !!ev jî kê maniyek

Tenêtiya Daxir, ji hêlekêve ji xêra wire bû, lê ji hêleke dîve, gelek zehmetê di kêşan

Hema di dema gonde, rebeno radibû xwe di gihand gundekî nêzîk, boyî xwe bighîne yek mê

Xwe qilûz dikir, û ta digihîşt ya mê,




bi dehên geza, ji kûçikên nêr dixwarin vedigeriya gund, ku di xwînêde maye !Ma wê çi bike ? ji neçariye Û gava ku berate, li gund çêdibûn. Gelek kûçik di hatin, û li dora berate kom dibûn . belengazo!! Ji beratê gundê xwe jî, bê par dima. Qey xwedê wilo kiriye, para vî bextreşî, di tiştê xweşde nîne! Dilê min gelekî bi daxir di şewitî, lê ma ez dikarim çi bi kim? tu di !!zanî, cira kûçikan nexweşe Bi salan , daxir bi vî awayî, jiyana xwe berdewam dikir

Ta roja daweta kurê hecyê me, di wê Dawetê de, gelek fîşek, hatin berdan, ji tîrsa fîşekan, daxir bi çolê ket, û bazda, û ji wê rojêde ew teba windabû. Piştî çûna daxir, gund Êvara bê deng dibû. Di virde, gundiya soz dan, ku li Daxirê xwe bi gerin

Çend rojekî pirsyanekê xurt lêkirin, û axê gund jî ciwanmêr tiligrafek di riya leşeran re rêkir

Lê qey qedera gundê me bû navê wî (bibê((gundê bê kûçik

selam Darî zindana Edra





Têknologî û IT

Gerek xort û ciwanên kurd êdî berê xwe,,
bidin çêkirina teknîka têknologî, ta karibin

têknologiyek taybet bi kurdî peyda bikin, ji
ber bikaranîna têknologya bi tenê ne bese
di

dema nû de» weha Aras Hesên (serekê
kompanya Brick IT li Stockholm, Swêd) di

hevpeyvîna kovara Welat de got, û li ser
bingehê Têknologî weha berdewam kir û
axivî: Bingehe

,(1 0) Têknologî û IT du numere ne
ji cihekî (1 0) Program: sivikbûna livandina
heya

cihekî din bi rengê hêsan peyda dike.
Computer, Laptop, telefon.. tevde mekîne
ne, karê

bi hêsanî û (1 0) wan pêkanîna levandina
.herweha pêkanîna karê mirovan bi hêsanî

Smartphone: ev mekîneyên nû (ku bi xwe
Computer in, lê mirov kare pê bi telefonê

bi axive) Informationan bi hêsanî û bê sînor
belav dike. (mirov dikare ziman û pirtûkên

kurdî bi hêsanî bixwîne, û ev jî ji bo kurda û
.(miletên bin dest qezenceke pir mezine

Bê guman, chawa kirîzên abûrî hene, weha
kirîzên Têknologî jî

90î de kirîza IT çêbû, hene, di dawiya salên
dema IT nû belav bû , kompanî û

fîrmeyên IT bi çavekî xeyalî lê dinêrîn, û
weha di çavê mirovan de jî wênedikirin. Lê

ji wê ,tenê karîbûn stranan bikin mp3
bêhtir nikarîbûn sozê xwe pêk bînin, loma
kirîz pêda

.bû û bêhtirî salekê berdewam kir.

Welatên pêşketî herdem cihê xwe di



Têknologya de dibînin, mîna Swêd, ku
dixwaze

ipad bixe şûna pirtûkên dibistanan de,
,000 ,15 herweha niha Turkiye jî wesîtiya
000

ipad kirye da ku li xwendevanên dibistanan
.belav bike û bixe şûna pirtûkan de

Em wekû kompanî dibînin ku gelek ipad
hene lê app (Applikation) ê pirtûkan ji bo

dibistanan tunene, loma niha pilana
kompaniya me ewe çêkirina pirtûkên
taybet bi ipadê

ne pirtûkên pdf, ji ber ku pdf nahêle mirov)
bi serbestî ipad bikar bîne). niha me

6an bi 1ê ta pirtûkên Matematik ji klasa
Swêdî çêkirine û di bazara app an de pêda

dibin, û me dest bi çêkirina pirtûkên
Mathematik bi zimanê Kurdî, Inglîzî û
Elmanî

kirye (ji ber di kompanya mede bingehê û

sozek heye ku em çî app, pirtûk bi çî

zimanî çêbikin emê wek wê bi zimanê kurdî
.(jî çêbikin

Pirojeyek me niha bi şaredariya Amedê re
heye, ku em ji wan re appeke gerokî li ser

.bajarê Amedê çêdikin

Wekû wejî bi mere bi kurtî dît ku despêka
her Têknologiyeyeke nû ji bo kêfxweşiyê tê

bikaranîn û hêdî hêdî mirov û welatên
dêmkatî û pêşketî berê xwe didin qezenc
û

fêdeyên ku ji Têknologya tên. Em bi hêvî
,e ku milletê kurd jî zu vê çîrokê fêm bike

ku vê Têknologya ji bo pêşketina xwe bi
kar bînin, ji ber çiqas mirov zû bi vê

pêşketinê destpê bike ewqas mirov fêde
.dike

Kawa Ibrahim

ZIMANÊ ME



Zimanê me, zimanê me,
Tuyî erd û esmanê me,
Tuyî derd û dermanê me,
Şûrê destê şervanê me.
Zimanê ma.

Berfa serê Sîpanêyî,
Kûraya be'ra Wanêyî,
Hêrsa Firat û Diclêyî
Ruh û rêyî, şîrê dêyî,
Zimanê me.

Zimanê me bextê meyî,
Xemil û rihal, rextê meyî,
Li nav neyar-nexweza da,
Dewlet, tac û textê meyî,
Zimanê me.

Zimanê me kela çiyani,
Antêxê nav dewranani,
Şewqa Şemsê meyî nûrîn,
Agir-alav û volkanî,
Zimanê me...

Tu ronahiya çavê me yî,
Bîna li ber devê me yî,
Emê hebin, em namirin-
Heta tu li dinê heyî,
Zimanê me.

Eskerê Boyîk

Dema dilek zêrevanê daristanê bedaristanê be



Girtî bûm..
li nav helbesta te,
korpîna dilê min, tîpên şikestinê
fêr dibûn.
Ez hînî şiyariyê bûm, li ser mistek
ba, min hest windakir.
Ji vî gewdeyî min azad bike, birînê
ji xurbeta min birevîne
Ji kêrên sipî re min rût bike, bike
nêçîra maçekê.
Min ji nav diranên zimanê resen
derbixe
Ji bo darên şahiyê bigirninjin,
min dûrî şîna şehrezadê bike.
Ez ji çîroka we têr bûm.
Helbestvanek im, westegeha dawî
ya evînê me,
valahiyek im, di gešta ziman de,
keçên ciwan dispêrim rondika
spêdê

Ez, şevê fêrî menekîrkirina
belatînkana dikim
dibim geştêk, efsanên helbesta
xwe şeh dikim
ji zeviyên zimanî,
şikestinên xwe dirêsim
welatekî peyvê me, rênasê baran
û bayî.
Ez ji seferê têr bûm,
were serê xwe deynim ser hinarkên
dêmên te
Ez dizanim di nav dilê te de
bîbelerzek heye,
ez di nav çavên te de zarokekî
biçûkim
dilê min şetekî mezin e
berbi tablo û helbesta xwe ve
direvin.
Ez cîhaneke sava me,
di mişextiya pirsê de.

Tengezar Marîni

Xebatkarên kovara welat silav û rêz

Ez karê we pîroz dikim
û serkeftinê ji were
dixwazim
Ez bi vê helbestê
kovara we xelat dikim
kovara welat
kovara welat pîroz û
mizgîn
Gelek ciwan e bi xeml
û rengîn
kovara welat nîşan û
xelat
Li Kurdistanê wek rojê
hilat
Zimanê kurdî hatiye
nûsîn
Zimanê zengîn bi
peyva zêrîn

Bi kar û xebat tê
berhevkerin
Li nava welêt tê
belavkerin
Rûpelê rengîn wêje û
zanîn
Lê xwendina wê pir
xweş û şêrîn
Divê şiyarke ciwanên
kurda
Bi kar û barkê da nebin
wenda
Zana û jîrbîn welat
parêzbin
Bi hizr û bîrbîn ceger û
hêzbin

lazgîn dêrûnî




Quntar

Ronahî perîka xwe ya
mezin
Bi ser Birca Dêrê ve û
Dikana Darbestan ve
diavêje
Li devera ku doh lê
sekinî bûm û li bendî ya
ku wê min
Ber bi çiyê ve bibe
mabûm
Lê min Paytonên
Awazan ên ku bi sal û
deman
Me di xew di dibirin,
nedîtin.

Roj wek Hevalekî ku li
bin Pencereyê difikîne
bang li Gavên min dikin
da ez bi wan Pêpêlkên

dûr ve hilkişim Bayê
sivik spîbûna Pelên
me fetisand Xîmaveke
şîn di şînbûna
Melevangehê de hiliya
Dûra êvara şîni tarî
tiştê me ew nivîsandî
veşart Û me ber sîngên
Gumlikên xwe vekirin
Wek Bavanine sivik ku
tiştêkî nalivînin.

Ber Destê sibê , li ser
bermayê Helbesteke
biseravketî Me
Serteşiyekî sor dît û
ew xwe deytîne wek
Peyveke
Tikî tenê ji mirinê flitî.



Helbest : Colan Hacî
wergerandina ji Erebi : Ciwan Qado



ولات «ثقافية - عامة - مستقلة»

العدد الثالث ٢٠ حزيران ٢٠١٣

welat.press@gmail.com

www.facebook.com/DengeKurdistanasurya